

Pispor li gorî cerebeyan

Cerebeya zarokanînê ya dayikeke ji Sûriyeyê ku bi Sponsorîya Civakî hatine cîwarkirin

Hevpeyvîna me ya bi Mirvat re bixwîne, ku ew bi zelalî behsa cerebeya xwe ya zarokanînê ya li UKê dike û cudahiya wê ya ji Lubnan û Sûriyeyê dike.

Zarokanîna li welatekî ku mirov pergala û pêvajoyên wê nas nake, zimanê wê derê nizane û li derdorê heval û nas û malbat tune ne ji bo hemû malbatan cerebeyeke tirsnaq e. Mirvat li ba me rûnişt ku behsa cerebeya xwe ya zarokanînê ya li UKê kir û vê bi zarokanîna li Lubnanê û Sûriyeyê re muqayese kir û her wisa behsa piştgiriya koma Sponsorîya Civakî ya Chulmleigh, Devonê ya di vê pêvajoyê de kir.

Gava te zanî tu ducanî yî, çend mehên te li UKê temam bûbûn?

Sê mehan piştî hatina min a UKê. Ez nîsana 2021ê hatim vê derê û meha temûzê min zanî ez ducanî me.

Gava min ev bihîst, ez gelekî kêfxweş bûm, hemû malbat kêfxweş bû; mêrê min, zarokên min, her kes kêfxweş bû.

Kêliyeke gelekî xweş bûye. Gava te ev bihîst, hîç xem û fikarên te çêbûn?

Ji ber ku min zimanê wê derê nedizani, di serî de xemên min çêbûn. Wekî mînak, xema min ew bû ka ez ê çawa herim randevuyên nexweşxaneyê yan jî randevuyên din yê bikjîşkî yê têkildarî ducanîbûnê. Lê komê ez bi tenê nehiştim. Ew hemû dema bi min re bûn. Her 15 yan 20 rojan carekê randevuyên me yê nexweşxaneyê yan jî yê bi pîrikê re hebûn, Gava siyareya mêrê min tune bû, komê ez datanîn wê derê û paşê jî ez werdigirtin. Û piştî siyareya zilamê min çêbû, ez bi xwe çûm. Piştî ez cara pêşî bi serê xwe çûm, min fêm nekir ka çi dibêjin. Loma endamên komê dîsa bi min re hatin ji bo ez tiştên ji min re tên gotin fêm bikim.

Nexweşxaneyê tercûmanek anî?

Nexweşxaneyê ji bo axaftina li ser telefonê tercûman peyda kir, lê di destpêkê de ji bo min zaravayên cuda yê tercûmanan zehmet bû, lewre di erebî de zaravayên cuda hene. Min gelek caran ji wan dixwest ku heman hevokê dubare bikin ku ez fêm bikim, paşê min ji wan xwest ku tercûmanekî bi zaravayê min diaxive peyda bikin.

Gava tu diçûyî randevuyan te wisa hîs dikir ku têra xwe piştgiriya didine te?

Erê. Ji bo zarokanînê jî, gava ez çûm nexweşxaneyê wan ji min pirsî ka ez xwezayî dixwazim an jî sezeryanê. Min got, ez jixwe sezeryanê dixwazim. Wan dîroka zarokanînê ji min re got, wan bi hesaba hefteyan got, ku li welatê min jî wisa bû. Gava wan dîroka zarokanînê da, Miriam [Sereka Komê] li ba

min bû. Min dikarî heta meha şeşan ya ducanîbûnê beşdarî dersên xwe yên ESOLê bibim, paşê min rawestand.

Ez dizanim du zarokên te yên mezintir hene ku ew li derveyî UKê ji te re bûne. Tu dikarî zarokanîna li UKê û li Lubnanê yan Sûriyeyê çawa bidî ber hev?

Li UKê her meh testa xwînê û ya îdrarê digirin. Min her car meraq dikir ka çima ew vê dikin, lewre li Lubnan û Sûriyeyê heke tu herî doktorekî divê ew doktorekî taybet be. Û testan meha pêşî û mehekê beriya zarokanîne çêdikin. Heke tu herî nexweşxaneyeye cemaweriyê, heta ku tenduristiya te baş be ew ê testên xwînê û testên din yan jî tiştêkî din nekin. Ew ê bibêjin, ev ne lazim in. Gava wan li virê ev test çêdikirin, min meraq dikir ka çima her meh dikin! Û wan digot, ew dixwazin zanibin ku ez û bebik baş in.

Di navbera pîrikên vê derê û yên wê derê de çi cudahî hene?

Li Sûriyeyê pîrikek tê lê tenê gava zarokanîne. Mirov ji bo kontrolê yan jî ji bo testan naçe ba pîrikan, tenê ji bo gava zarokanîne. Û berê qet pîrikek bi min re eleqedar nebûbû. Pîrik her wisa gava sezeryana min testên ekstra jî çêdikin. Wê got, 'Ez ê testekê çêkim ku bizanim ka bi te re enfeksiyon heye yan na.' Û ev ji bo min gelekî baş bû; li Sûriyeyê tiştêkî wisa tune ye, ew li wirê testên wisa çênakin.

Cerebeya te ya li nexweşxaneyê û beşa zarokanîne çawa bû?

Di destpêkê de, gava tercûmanî di ser telefonê re bû, ez hînî vê nebûm, û ez bi vê hinekî xemgîn bûm. Lê gav bi gav ez hînî vê bûm. Her wisa, nexweşxaneyê anestetîstek da min ku ji Misirê bû û ew bi min re bi erebî diaxivî û wî tişt ji min re şîrove dikirin ku vê rehetiyek da min. Wî digote min, 'Heke ji te re tiştêk lazim bibe, bibêje min, ez ê ji te re şîrove bikim', û vê rehetiyek dida min.

Tiştêkî din yê baş jî ev bû ku wan destûr dida ku mêrê mirov bi mirov re bikeve odeya zarokanîne, ku li Lubnan û Sûriyeyê destûrê nadin tiştêkî wisa. Hebûna mêrê min li ba min ji bo min baş bû, lewre xwişkên min yan jî diya min ne li ba min in, û ev ji min re bû alîkar. Ez demeke zêde li nexweşxaneyê nemam. Min roja îne zarok anî û roja yeksemê min karî ji nexweşxaneyê derkevim. Cerebeyên min yên berê yên li Sûriyeyê cudatir bûn ku li wê derê dihêlin mirov tenê 12 saetan bimîne û paşê divê derkeve. Heke rewşeke taybet tune be, te ji nexweşxaneyê derdixin lê heke problemek hebe mirov dikare zêdetir bimîne.

Komê di hemû mijaran de alîkariya me kir, wan tu caran em bi tenê nehiştin. Û heta niha jî heke bi dibistanan re, bi Navenda Kar re yan jî heke yek ji me nexweş be, ew di hemû mijaran de alîkariya me dikin. Wan gelekî alîkariya me kir.

Û niha rewşa te û ya bebikê çawan e?

Em baş in. Ew gelekî mizemiz dike! Her wisa hevalên mêrê min hene, şeş heft malbat in ku piştî me hatine vê derê. Wan ji min pirsar ducanîbûnê û rewşa kar kir, lewre ew ji ber astengiya zimên xemgîn bûn û wan nedizanî ka ew ê di vê mijarê de çawa bikin. Û min ji wan re got, ev tişt li virê gelekî hêsan bûn.

Jineke ku dê di nêzîk de jê re zarokek çêbûya, ji min re got, 'tu dizanî, wan testa xwînê girt û ew her car dibêjin ku ez pîrikê bibînim'. Min jî digotê ku ev normal e. Ev tenê ji bo hindê ye ku zanibin tu û bebik baş in. Gelek kes hene ku xema anîna zarokan dixwin.

Gelo tiştekek heye ku te nedizanî lê tu dixwazî ku te zanîbûya?

Baş tê zanîn ku li virê mirov di wextê xwe de diçin randevuyan, lê gava mijar randevuyên nexweşxaneyê be, rewş diguhere. Wan nameyek şandibû ku tê de digot divê ez saet 3yan li wirê bim, diviya ez saet 3yan li wirê bûma, lê wan dê saet 4an telefonî min bikira! Lê gava mirov dereng bimîne û wekî mînak, bibêje, li ser rê trafîk hebû yan jî tiştekek qewimî, ew ê bibêjin, 'o na, tu dereng mayî, çima tu dereng mayî?'

Tiştêkî din ku tê bîra min - gava li Sûriyeyê yek zarok tîne, reçeteyeke tije antîbiyotîk didinê. Heke enfeksiyona te tune be jî, ew ê ji te re lîsteyeke dirêj ya dermanan binivîsin. Lê li virê tiştên wisa nakin û gava wan reçeteyek neda min ji min re acêb bû. Li virê gotin, heke êşa min hebe ez dikarim paracetamol bistînim - cudahiyek ev bû.

Cudahiya din, li Sûriyeyê piştî emeliyata sezeryanê ew dibêjin ciyê birînê heta 10 rojan neşûn, lewre rîska enfeksiyonê heye. Lê li virê, pîrikê ji min re got ku piştî 24 saetan herim dûşekê bistînim û min got, 'Ez nikarim dûşekê bistînim!!' Lê li virê gotine min ku ez rojê du carann dûşekê bistînim. Tê hişê min, gava li Sûriyeyê keça min a pêşî çêbû, min xwe gelekî nepaqij hîs dikir. Min ji diya xwe re digot, ez wisa hîs dikim ku sipe di porê min de hene, wê jî got, 'Nexwe here tenê porê xwe bişû.'

Doktorê vê derê ji bo birîna min jeleke dûşê nivîsand. Min demildest dûş stand û min hîs kir ku ev ji lîsteya antîbiyotîkan çêtir e.

Û piştî zarokanîne pîrik sê rojan carekê hat serdana min ku bebik ji bo zerekê kontrol bike. Li Sûriyeyê xizmeteke wisa tune ye. Ew giranî û pejna bebik dipîvin û careke din piştî neh mehan li wan dinêrin, paşê xebatkarê tenduristiyê vî peywirî digire ser xwe.

Gelo tiştêkî din heye ku tu derbarê cerebeyê zarokanîne de ji me re bibêjî?

Ez dixwazim vê bibêjim, heke li virê zarokeke din bînim, ez ê bixwazim ku tercûmaneke jin bînin, lewre tiştin hene ku ez fedî dikiim bi tercûmanekî mêr re biaxivim. Min qet tercûmaneke jin nexwest, lê ji min re gelekî zehmet bû ku li ser hin tiştan bi yekî mêr re biaxivim. Yan jî careke din gava ez bixwazim zarokekê bînim, ez ê dikaribim vî zimanî biaxivim ku pêdiviya min bi tercûmanan tune be!

Gelekî spas, Mirvat!

Miriam, sereka komê ev lê zêde kirin:

Ez wisa difikirim ku çêtir e mirov di rewşa ducanîbûnê de ne gelek kesan lê kesekî tenê wekî xala referansê bigire. Ev yek di vê rewşa me de gelekî baş bi kêr hat. Û kenê xwe bi vê nekin, ev gelekî kêfxweşker e. Kenê min ê pêşî yê ji zik ew bû ku gava ez li ciyekî dûr bûm min wêneyê ducanîbûnê girt - ev tiştêkî gelekî pozîtîv bû. Min got, 'Xwedê, bi vê jinikê re COVID heye'. Û ji bo zaroyan, ji ber ku ew di serî de pir eleqedar bûn, wan hê zûtir dizanî ka mesele çî ye. Em çûn malê û me mal bi balonan xemiland, ew wekî pîrozbahiyeye mezin bû. Me dibistan jî tev li vê kir, ji bo ku çawa Tala çêbe zarok dikaribin bi riya lêgerîna vidyoyî ya WhatsAppê dayik, bav û bebikê bibînin, ev nûwaze bû. NHS bi temamî gelekî baş bû. Gava ji bo hin rewşan di demên kin de ji me re randevu lazim bûna, ew hestiyar bûn. Wan doktorekî bi erebî diaxive peyda kir ku hemû tercûmanîya wê bike, ew ji bo mirovan dixebitîn. Ji bo min tiştê giring ev bû ku em gelekî kêfxweş bûn û wextekî gelekî xweş bû.